Qanûnên avahiyê - Dawîn carê sala 2019an hatiye birojkirin

Xwesteka me ev e ku tu li malê hesta rihetiyê bikî. Rola te û cînarên te di serêxwegirtina vê armanbcê de girîng e. Jiyana komkî ya bi kêfxweşî jibo me gellekî binirx e. Eger gist bi baldarî, wisa ku çaverêtiya xwe ji kesên din hene, avahî û şînahiyên derdorê bi kar bînin, dikare pêşî li nerihetî û gengeşeyan bê girtinê. Ev "Qanûnên Malê" eger ji aliyê tevahiya rûniştiyan va bên berçavgirtin, pêkvejiyana aram û bêkêşe dê jibo giştan were misogerkirin.

<u>Qanûnên jêrê berçav bigire:</u>

Hertim heta radeya pêkan dengên bilind dernexîne

Mirov hemî li ser deng hestyar in. Gemariya deng hokara herî naskirî ya gengeşeyê li taxê ye. Lewre hertim, nemaze ji siet 1 heta 3ê PN (Piştî Nîvroj), ji siet 8 heta 7ê Sibehê, her wiha di rojên Yekşemiyê û betlaniyên fermi bila yên din bi dengê te aciz nebin. Versiyona herî nû ya "Qanûna kêmkirina gemariya deng a Almanyayê" ("Verordnung zur Bekämpfung des Lärms" – LärmVO) pêwîst e were berçavgirtin.

Helbet, eger pêkanîna gemariya deng ji ber karên têkildarî avahiyê bi neçarî be, ev kar divê di heyama demî ya 8ê Sibehê heta 1ê PN û ji siet 3ê PN heta 7ê Êvarê di rojên asayî da (Duşemî heta Şemî) pêk bên.

Wek qanûneka giştî, belavkirina mûzîkê, ji wan jenîna alavên mûzîkê nabe ku rûniştiyên din aciz bike.

Berçavgirtina Bêdengiyê divê cihê lîstinê û qada Pêgog anku Fûtbalê jî lazim e.

Tevgerên li Avahiyê

Eywan û Balkon

Balkon û eywan bandorê li ser teşeya derveyî ya avahiyê dikin. Ji lewre, em ji kirênişînan dixwazin ku vê nimaya mîmariyê bêyî destûr û bi zêdekirina alavên parastinê, panel an tiştên bi vî rengî neguherînin. Rûniştiyên ku bixwazin alavên parastinê an tiştên weke wan li balkon an Eywanê zêde bikin, gere ku destûrê ji xwedîmal werbigirin. Boyaxkirina eywanê bi rengê dilxwaz jî jibo rûniştiyan rêpêdayî nine.

Kncêîn ku jibo zuhakirinê li atmosfera Balkon an Eywanê tên raxistin û daleqandin, nabe ku ji dûr ve bên dîtinê. Jibo ku heliyana berfê an giraniya berfê ziyanê negihîne avahiyê, rûniştiyên avahiyê divê berfa balkon û Eywana ser bi avahiya xwe rêj bikin.

Guldankên ser pencereyê û guldankên din tenê dikarin li ber şibakê an li pêşiya eywanê bên danîn; Helbet eger alavên munasib jibo pêşîlêgirtina ji ketina Guldankê û rijiyana avê pêve hatibin kirin.

Di dema avdana guldankan li balkon û lêvka pencerê, divê lê miqate bî ku v neçe aliyê dîwar an balkon û cihên din û wan nelewitîne.
Bikaranîna her cûre kebabpêjê li balkon, eywanê û tirasê bi giştî qe3dexe ye.

Heywanên navmalî

Xwedankirina heywanên navmalî dikeve bin qanûnên parastina heywanan.xwediyên heywanan erkdar in ku bi başî û li gorî qanûn û rêzikên pesendkirî yên gelemperî heywanên xwe biparêzin û xwedan bikin. Ji billî heywanên navmalî yên biçûk û nasyar (weke Masî, Beliban (Hamster), Firinde), xwedankirina heywanên navmalî girêdayî bi wergirtina destûrê ji xwediyê malê ye.

Li avahiya ku cihê mayînê, xwedankirina se û pisîkan bi giştî bi girêdana kap û zincîrê û heke pêwîst bû bi girêdana bêvilbendê rêpêdayî ye. Di demsala hêlînçêkirina firindeyan (ji 1ê Adarê heta 30ê Îlona her sal), divê pisîk li nav malê bimînin. Xwediyên heywanên navmalî divê zîrç mîrçê wan bi taybet gûyê se û porê heywanan derdem ji nav avahiyê (weke Asansor û Pilekanê) an Komavahiyê (Weke rêbihurk û çîmen) paqij bikin.

Berdana seyî li nav Komavahiyê qedexe ye. Xwediyê seyî divê dilniya be ku seyê wî nebe metirsiyek li ser microvan, heywanên din an mal û heyitiyên kesên din. Bi taybet birina seyî bo qada lîstina zarokan, Çîmen an qad û şînahiyên gelemperî yên derdora Komavahiyê qedexe ye.

Liv û tevgerên li nav avahiyê

Cihên gelemperî

Jibo parastina ewlehiya xwe, hemî deriyên avahiyê hertim bigire. Deriyên ku digihêjin rêyên derketin aawarte (Agirpêketin) li nav avahiyên bilind û deriyên ku digihêjin rêya jêrzemîn û ambarê divê hertim girêdayî bin.

Ragirtina madeyên agirzê (weke qutya benzînê) li jêrzemînê qedexe ye. Jibo pêşîlêgirtina ji agirpêketinê, çûyîna bo Jêrzemîn, ambar û cihên wisa digel agirê bêparêz qedexe ye. Ragirtina tiştan li ambar, odeya Boyler, odeya şûştinê, pilekan an rêbihurkên Jêrzemînê qedexe ye.

Piştî bikaranîna cihên gelemperî, divê çira bên xevakirin. Di
rewşa sirr û sexemê da, girêdayîna pencereyên jêrzemînê, pencereyên derve û riyên ku têkillî bi derve heye, pêwîst e.

Pilekan û rêbihurk

Jibo pêşîlêgirtina ji qewimîna bûyeran û paqijbûna rêyên revê, ragirtina duçerxe, motorê gazî û Kaliskeyê li pilekan, jêrzemîn, rêbihurk û an korîdorê qedexe ye.

Jibo girtina pêşiya qewimîna bûyerê, pêderîyên taybet li têketingeha avahiyê û rêyên ku digihêjin pilekanê daneynin. Kirênişîn li hember xesarên ji ber binpêkirina van qanûnan berpirsiyar in. Xwedî malê li hember bûyerên têkildarî jinavçûna pêderî yan solan, berpirs nîne.

Her beşên pêlekanan an salonê ku di encama cîbicîbûna kelûpelan de xesarê bibînin, yan qirêj bibin, divê demildest bên paqijkirin an bi rêbazeke pêşketî bên çêkirin. Ev buyer divê ji GESOBAUyê re bên ragihandin.

Heke qirar be ku kirênişîn avahiyê paqij bike, tenê dikare bi paqijkeran vî karî bike, da ku made yan rengên ku ji bo paqijkirin yan darotina kefê, pencere derî û pêlakanan hatine bikaranîn, têk neçin. Kefpoş divê bi baldarî û diqet bê paqijkirin.

Reftarê derveyî avahiyê

Cihê servekirî

Ewlehiya avahiyê beşek ji erkên xwediyê avahiyê ye. Lewre, şênî nikarin pêlîstok, trampolîn yan hewzên taybet êm sabit û gerok daçikînin. Sipas ji hevkariya we re. Heke ev qanûn neyê berçavgirtin, ti berpirsiyariyeke xwediyê malê tine.

Heke hewşa hindurîn bê bikaranîn, divê her tim paqij û rêkûpêk be.

Ji parastina berjewendiyên hemû kirênişînan, bikaranîna kebabpêjan di nava hewşê de qedexe ye. Divê bê zanîn ku pêkhateya mîmariya taybet a hewşê dibe ku bibe sedema aciziya şêniyan û bêhna ne xweş li derdorê belav bike. Tê payîn ku ev rewş bibe sedema nerazîbûna cîranan. Bikaranîna kebabpêjan tenê li cihên diyarkirî azad e.

Parkîng û îmkanatên parkîngê

Ji bilî parkîngên giştî, bikaranîna hêwana parkîngê, hewşa taybet a erebeyan, parkîngên fermî û parkîngên sergirtî, tenê bi hebûna destûrê, pêkan e. Tenê erebeyên ku destûra wan a fermî heye, dikarin li van cihan bên parkkirin.

Divê ajokarên erebe, motorsîklet û wesayîtên din bêserûber li tûtikê nexin, motorê beredayî vêxistî nehêlin û li hindurê avahiyê deriyê erebeyan tund negirirn.

Şûştin yan çêkirina erebeyê di nava parkîngê de qedexe ye. Bi taybet divê ajokar tiştên wek rûn û hênikkerên erebeyan nerijînin ser erdê.

Reftara bi heywanan re

Dayîna xwarinê bo kevok yan ajelên hov qedexe ye. Ev yek dibe ku bibe sedema qirêjbûna avahiyê, yan belavbûna nexweşî yan mişkan d nava avahiyê de. Bermahiyên xwerekan dibin sedema berrbelavbûna afatên qirêj.

Li zarokên xwe miqat bin

Wek qanûneke hiştî, zarokên ku dixwazin li derveyî avahiyê li kompleksê de bilîzin, divê li cihên ku ji bo wan hatine terxankirin, bikin. Wê demê divê dê û bav, serperist û mezinên çavdêr miqat bin ku
lîstikên zarokan, bi taybet di dema îstrehetê, nebe sedema acizbûna derdorê.

Ajotina duçerxeyan di kompleksan de divê ji şêniyan re pirsgirêkan dernexin. Her wiha, ajotina duçerxeyan û lîstika fûtbolê li nava şînkayî, hews û li ber deriyê avahiyan qedexe ye.

Cihê ku di kompleksan de ji bo lîstikan hatiye diyarkirin, divê her tim paqij be. Lîstikên zarokan di nava avahiyê de, divê ji derdorê re pirsgirêkan çênekin. Dê û bav û serperis divê baldar bin ku zarok û nûciwan, bi taybet di demên îstrehetê de, derdorê nekin qerebalix.

Agahiyên girîng li bara avêtina bermahiyan

Zibil tenê divê li bara zibildankê de bê rijandin. Devê zibildankan divê piştî ku zibil hat rijandin, bê girtin. Bi taybet, bermahiyên pêjgehê, rijî, avkiyên xeternak û madeyên wek wan nabe di nava tiştên wek kasikên twaletan, teştên kincan û hwd de bên rijandin.

Odeyên komkirina bermahiyan û derdora zibildankan divê her tim paqij û rêkûpêk bin.

Zibil berî ku di nava zibildankên taybet de bên rijandin, divê di firaxên dergirtî yên di nava malên îcareyî de bên ragirtin. Danîna zibilan di nava pêlekan yan cihên giştî qedexe ye.

Ji bo parastina jîngehê û kêmkirina mesrefê, bikaranîna zibildankan ferz e. Servîsên şaredariyê yên paqijiyê, dikarin bermahiyên mezin, wek doşik, qutî û sindoqan kom bikin. Şêniyê ji bo vê servîsê divê ji Berliner Stadtreinigung re telefin bikin.

Cebeyên biçûk û karton divê berî ku bo zibildankên bermahiyê yên kaxezî bên veguhestin, divê bên vekirin û biçûkkirin, da ku bi rehetî di nava zibildankan de bi cih bibin. Heke laylon ji bo veguhestina kaxezan bên bikaranîn, divê laylon bi awayê cida di nava zibildankan de bên bicihkirin.

Xalên dawîn

Erka hemû şêniyan e ku ji bo pêşîgirtina ji xetereyên wel cemad û tofan û agirdertinan alîkariya hevdu bikin
divê şênî nehêlin ku ziyan bigihêjin avahî, pêlekan, derî û apartimanan û nehêlin kesên dereke ziyanan bigihînin avahiyan. Heke kesekî xwest ziyanê bigihîne avahiya. Ji xwediyê malê yan jî ji polêsan re telefon bikin.

Ev Qanûnên Malê, beşeke zef girîng a Îcarenameyê ye.

Qanûnên Malê dibe ku di demên pêş de ji bo çakdazî yan guherîna şêwaza birêvebirina avahiyê, bên guhertin.

Ev erk, heta heke kirênişî nebe jî, divê di Îcarenameyê de hebin.

Dîrok: Dîrok:

Îmzeya GESOBAU AG

îmzeya hemû şêniyan